

# Xelatê Nobel bo çareseriyên nesaxiyan

E-mail: [Abdulbaghi.Ahmad@bupinst.uu.se](mailto:Abdulbaghi.Ahmad@bupinst.uu.se)



Dr. Ebdulbaqî Mayî

**D**u zanayên navdar (Barry Marşall) û (Robin Warren) sala 2005 ê, xelatê Nobel yê cîhanî wergirtin ji ber aşkirakirina wan ya corekê bakteryan bi navê (Helicobacter) wek egera peydabûna nesaxiya kulbûna urkê mirovî. Bêguman ev xebere êke ji mezintirîn rûdanên behis li ser hatinkirin.

Têgehestina vê çendê ne gelek ya bi zehmete, çunku lêkolînên van her du zanayan, nimûneyek pêşkeftiyê li dor serkeftina lêkolînên zanistî, diyare bi kêrhatina lêkolînên bo çareserkirina rewşa tendirustî ya xelkî bi şewekê seranser. Wan her du zanayan di karên xwe yên zanistî de ji destpêka lêkolînên xwe yên ku taqîgeh bi kar inane heta ceribandina lêkolînên xwe li ser nesaxan di dema 20 salan de şoreşgeriyek di çareserkirina vê nesaxiyê de kir. Ev nesaxiya ku gelek di nav xelkî de mişe û gelek caran jî bûye egera şeredevên dûr û dirêj di navbeyna nojdar û zanayan de li ser babetên suç, eger û çareseriyê û nesaxiyê. Ji bilî têkçûna rewşa tendirustî û şepirzebûna rehetiya xelkekê zor ji zarok û gencan heta pîr û kalan, ji kiç û jinan heta kur û mêran, ev nesaxiyê û encamên wê gelek caran dibûn egera mirina nesaxan. Her çende gelek nojdar û dermançêkeran rêkên cuda bo çareseriyê û nesaxiyê peyda dikirin, kes neşiyabû êş û elemên û nesaxiyê qutbir bikin heta van her du zanayan ev mikrobe diyar kirin wek egerek bo peydabûna û nesaxiyê.

Berî ev her du zanayê encamên lêkolînên xwe belav bikin, êk ji tîzên şirovekirina egerên û nesaxiyê dihate vegehan bo rewşa derûnî ya nesaxan. Her wek gelek carên di dema egerên nesaxiyekê aşkira nebin edî nojdar û pispor babetên derûnî dikin eger, çunku derûn gelek ya ji leşî bi zehmetire mirov li ser lêkolînên bike û tê bixebite. Ji ber vê êkê edî her gaweke mirov neşiyaba nesaxiyekê çak şirove bike û egerên wê bizane, mirov da bi sanahî dişên egeran bihê ser babetên derûnî bêyî ku kes zêdetir pirsyaran bike an mirovî şepirze bike. Nûke jî hêştê gelek nesaxiyên leşderûnî yên hene, anku êş bi xwe li leşî diyar dibe belê sûç û eger di arîşên derûnî de dihên nîşandan. Çêdibe gelek ji van nesaxiyan egerên mikrobî hebin belê hêştê zanist negeheştiye qonaxa aşkirakirina wan lewma çareseriyê wan nesaxiyan bi dirûstî nahê kirin.

Belê wergirtina van her du zanayan ya xelata Nobel wesana zanist hişyar kir û zixtek li hizr û bîrên zana û pisporan da ku di gelek babetên di jî, da ji bilî kulbûna urkê mirovî hizrên nû peyda bikin. Ewe ya bûye egerek bo me hizrê xwe di modêlên nû de bikin ji bo tefsîrkirina nesaxiyên derûnî û leşderûnî. Her çende em hêştê yê li destpêka şirovekirina derûna mirovî ku bi rengê zanistî lêkolînên li ser bikin, belê gelek pêdiviyê em hemû nesaxiyên ku egerên wan diyar û aşkira nebûn, nekine di paxla derûnê de û bikin pênasên derûnê. Divê serad û bêjîngên me her dem bi zanistê saz kirîbin û amûrên me yên lêkolînên bi zanisteka pêşkeftî wesa bin û hizr û boçûnên me her bi şewekê rexnegir di bizav û xebatan de bin da çend zûtir e, çêtir egerên nesaxiyan diyar bikin û çareseriyên wan bikin.